Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1233 | 25-Berfanbar-2024 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Helbest û Şi'r



**Rênas Jiyan**

Nivîskar û rewşenbîrên bi xwe ne bawer, ên nejêhatî, dilbijok û sist, di demên dawî de ji dêvla peyva helbestê peyva "şi'r"ê bi kar tînin.

Peyva "helbest"ê di salên 1990'î de di nav rewşenbîrî û civaka kurdan de pêş ket. Ev peyv ewqasî pêş ket ku gelek dê û bavan navên keçikên xwe kirin "Helbest". Bi rastî jî navê "Helbest"ê navekî estetîk, navekî biekl û bi teql e. Lê belê nivîskar û rewşenbîrên bi xwe ne bawer, ên nejêhatî, dilbijok û sist, di demên dawî de ji dêvla peyva helbestê peyva "şi'r"ê bi kar tînin.

**Mommsen di pirtûka xwe "Dîroka Romayê" de dibêje:**

"Romayiyan ji helbestê fam nedikir, ew tiştekî hêja nedihesibandin ku pê mijûl bibûna. Helbest dikirin karê jin û zarokan. Ewqasî qîmet nedidan helbestê ku di zimanê wan de peyveke bihata wateya helbestê jî tune bû." Di kurdî de ev peyv heye, ev peyv "HELBEST" e. Lê nivîskarên bêkêr vê peyvê davêjin û xwe bi "şi'r"a biyanî dikin zilam, dikin"şa'ir"!?

**Dilbijandina serdestan!**
**Ya star!**

Rewşenbîriya bindestan divê li ser binyad û bingeha xwe ava bibe, ne li ser a serdestan. Dîwarê serdestan, ê ku bindest xwe dispêrinê, dîwarekî xerabe ye. Rewşenbîriya kurdan, wek pezê ku bixwaze gur di hawarê wî de were, hêviyê ji serdestan dike, çi aqil!? Ev derûnî, di peyva şi'rê de xwe dide der. Ev peyv delîlê derûniyeke qels e. Di vir de mesele ne peyva helbestê yan jî peyva şi'rê ye, mesele psîkolojiya bindestiyê ye. Heke peyva helbestê ya serdestan bûya, û ya şi'rê jî a bindestan bûya, wê îcar rewşenbîrên bindest xwe çeng bikira ser peyva helbestê. Ji vê derûniyê, tunebûn çêdibe, ne hebûn… Bi vê derûniyê helbestên baş nayên nivîsandin, kesayeta xerabe çêdibe… Şi'r (şiir), peyveke erebî ye, di farisî û tirkî de jî tê bikaranîn. Di Qur'anê de bi navê "Şu'era" (helbestkar-an) sûreyek jî heye. Armanca vê sûreyê ew e ku bipeyitîne Hz. Muhemmed pêxember e, ne helbestkar e. Di demê de bêbextî li Muhemmed kirine ku ew ne pêxember e, ew helbestkarek e. Li ser vê gengeşiyê ev sûre daketiye ji hêla Xwedê ve. Helbest tiştekî nazenîn e, zimanê Xwedê ye. Peyva şi'rê peyveke olî ye, peyveke ji "Qur'an"ê ye. Ev yek dike ku mirov xwe bispêre vê peyvê; ji ber ku ev, peyveke bingehsaz e, peyveke desthilatdar e.

Peyva şi'rê di civaka kurdan de jî tê gotin, dikare bê gotin. Peyveke biyanî dikare di zimanê miletekî din de jî cî bigire û mirov dikare pê bipeyive; ev normal e, tişt pê nayê. Ne rast e ku mirov peyveke di zimanê wî de bicîbûyî, ji bo ku ew peyv biyanî ye ji zimanê xwe derxe. Dibe ku şi'r di kurdî de jî hebe û pê were axaftin jî, ev ne pirsgirêk e. Lê heke peyva şi'rê ji peyvbûnê derketibe û bûbe derûniyek, bûbe sermezinatiyek, bûbe kompleksek, bûbe xwe-biçûk-dîtinek, bûbe ji-xwe-biyanîbûnek ev êdî ne normal e, tiştekî pir xerab e, nexweşiya serdestiyê ye. Resenî her tim xweştir e, ontolojîktir e, lê heke mirov li ser navê reseniyê nijadperestiyê bike ne rast e. Alav û amûrên kurdan giş ne pîroz in helbet, peyva helbestê jî ne pîroz e, miletên din jî tiştên wan ên xweş û hêja hene, lê belê heke tiştekî mirov hebe (ango helbesta kurdan hebe) û mirov wî tiştî bi tiştên serdestan (ango bi şi'ra serdestan) biguherîne û a xwe kirêt bihesibîne, vêya nabe rewşenbîrî, dibe kesayeta genî, dibe cahiltî, dibe giyayê tehl ê hewşê.

Dilbijoktî, dawiya wê digihêje hêsîrtiyê, nagihêje azadiyê. Rewşenbîriya kurdan bi dilbijoktiyê nikare tu huner û wêjeyê ava bike.

Vê gavê beşeke rewşenbîriya kurdan peyva xwe ya helbestê avêtiye û bi şi'ra ereb, faris û tirkan girtiye, ango bi peyva serdestên xwe girtiye. Pê girtiye ku bibe zane, bibe qedirbilind, bibe gibgibe. Nivîskarên kurd "kewê xwe bi serdestan difirînin", vêya bi wan xweş tê, bi vî awayî xwe elît û arîstokrat û girîng dihesibînin lê ev têkçûn e, biçûkbûn e. Mirovê ku siwarê hespê xelkê be, ango siwarê şi'rê be, wê her tim peya be. Nivîskarên bindest dixwazin bi alav û amûrên serdestan hebûna xwe şêrîn bikin lê nizanin ew alav û amûr hebûna wan jehrî dikin.

Her peyv bîr û bibîrxistineke wê heye. Peyva helbestê azadî ye, wekhevî ye, nûjenî ye, hevaltî ye, fedekarî ye, şoreş e, demokrasî ye, evîn e, xwezaparêzî ye, miletperwerî ye. Lê peyva şi'rê qesra padîşahan e, Nedîm e, Baqî ye, şelafî ye, qalib e, hengame ye, kawiktî ye, xulamtî ye, egoîzm e, tengbûn e, bindestî ye, desthilatdarî ye, monarşî ye.

Ji kurdan re "helbestkar" pêwîst in, ne "şa'ir". Ger şa'ir bin jixwe wa ye di nav serdestên kurdan tirk, faris û ereban de şa'ir pir in.

# Jinên Kurd bi berhemên xwe beşdarî pêşangeha li Tehranê bûn

**Bi boneya şeva Yelda berhemên dest ên ji aliyê jinan ve hatine çêkirin li mala Heft Dest a li Tehranê di navbera rojên 12-13'ê Kanunê de hatin pêşandan. Pêşangeh ji aliyê welatiyan ve rastî eleqeyek baş hat.**



Bi boneya şeva Yelda berhemên dest ên ku ji aliyê jinan ve hatin çêkirin bi armanca nîşandana çandî, li mala Heft Dest a li Tehranê pêşangeha hunerên dest hat vekirin. Hejmarek zêde ya jinan ji herêmên cuda yên Rojhilatê Kurdistan û Tahranê beşdarî pêşangehê bûn. Di pêşangehê de nexşandina sepete, ecoPrint (çap), kilîm, berhemên aksesuar hatin pêşandin. Pêşangeha ku welatiyan eleqeyek mezin nîşan dan, di navbera rojên 12-13'ê kanûnê de hat lidarxistin.

Çapa ekolojîk (ecoprînt), ji aliyê hunermend India Flint ve hatiye dîtin û li ser tekstîl, rêbazek çapa nebatane û bi temamî bi rêbazên xwezayî reng û awa dide. Xwendekara dîzayna tekstîlê ye du sal in Eco print çêdike Mozhgan Ardalan beşdarî pêşangehê bûye wiha got: "Eco prînt, çapek hawirdor ku tê de materyalên xwezayî, mîneral hatine bikaranîn e. Qumaşê wê ji malzemeyên mîneral tê dîzaynkirin, em tînin halê çapê, piştre jî em amûrên xwezayî bi kar tînin û gi-rover dikin û dibin bihara zêde de piştî du saetan li ser pelên wê bi hemû demaran çap tê kirin. Êdî ji bo riyeke parastina hawirdorê, qalikê pîvazê, qalikê hinarê, qalikê gûz û raventî em dikarin bi kar bînin."

**'Bi qasî pêwîst e piştgirî ji hunera me re nayê nîşandan'**

Peykertiraş Elham di pêşangehê de hunerên xwe yên kûzik pêşanda û diyar kir ku ji ber kêmaniya piştevaniya madî û sermayeyê, odeyeke xwe veguherandiye qada xebatê û destnîşan kir ku berhemdayîn nîn e û got: "Mînak û modêlên her tiştî hene û ez berhemên xwe li ser înternetê difroşim. Mirov bi qasî ku pêwîst e piştevaniya vê hunerê nakin. Gelek caran ez bêhêvî bûm. Lê belê ji ber min hemû sermayeya xwe li vî karî xerc kiriye, divê ez ji nû ve dest pê bikim." **NÛ JINHA**

Bi kamîreya Birûc Resûl



## FERHENGA BIWÊJAN

**Kurê mino ne ji mino, roja koçê barê mino:**
- Ti têkiliya min pê re nîne lê bûye belaya serê min.

**Li keleman qelibandin:**
- Teşqele jê re derxistin.

**Mar ji pûjanê ne xweş bû li ber kuna wî şîn dibû:**
- Dema yek ji yekî yan ji tiştekî ne xweş be û ew kes yan ew tişt nêzîkî wî bibe hingê tê gotin.

**Mar ji pûngê xolî dibû (direvî) li ber devê kuna wî şîn dibû:**
- Bi heman wateyê.

**Me got emê biçin serdana Mûsê em bûn kîrkêşê Mele Qêsim:**
- Me got emê biçin qenciyekê bikin em liqayî xirabiyê hatin. Em ji bo qenciyê çûbûn bela hat serê me; em ji bo karê xwe çûbûn çi hat serê me.

**Min mewîj jî avêtin pêşiya wî -dawa wî- dîsa min xwe jê xilas nekir:**
- Min lava jê kir, min rica jê kir, ez li ber geriyam dîsa min xwe jê xilas nekir.
(Ev biwêj li herêma Mûşê bi kar tê. Wisa xuya dike ji ber ku li wir rez nînin qîmetê mewîjan pir e. Di vir de pêşî li şûna dawa kiras bi kar tê)

**Pêgermokê digerîne:**
- Li belayê digere; ji xwe re nasekine. Pê li mala cinan kiriye
- Rastî kesên belakir hatiye.

**Pêsîra me bernade:**
- Belaya xwe ji me venake; bi ser me de tê.

**Pêsîra xwe jê xilas nekir:**
- Ket belaya wî; bû pirsgirêk.

**Pê ve bû dirdirik:**
- Belakir e; rûyê wî qayîm e; belaya xwe ji mirov venake; cira wî pir ne xweş e.

**Qirniya qûna bizinê ye:**
- Belakir e, eksoyî ye, mirov nikare xwe jê xilas bike, hevaltiya wî ne xweş e.

**Serê me êşand:**
- Ji me re pirsgirêk derxistin; em aciz kirin.

**Serê min diqdiqand:**
- Bi heman wateyê.

**Teniya bidohn e:**
- Belakir e, eksoyî ye, mirov nikare xwe jê xilas bike, hevaltiya wî ne xweş e.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## 'Şervanên YPJ'ê bi rihê Kobanê berxwedanê dikin û rê nadin dagirkeran'



Fermandara YPJ'ê Viyan Soran diyar kir ku ew bi rihê berxwedana Kobanê, li bendava Tişrînê li hemberî êrîşên hovane yên dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê bi îradeyeke xurt têkoşînê dikin û li ber xwe didin.**R-2**

## 'Armanca dagirkeriya Tirk derxistina tevliheviyê di nava pêkhateyên herêmê de ye'

**Rojnamevan Refîq Ibrahîm diyar kir ku bi rûxandina rêjîma Eseed re guhertinên bingehîn di Sûriyê de pêk hatin. Dagirkeriya Tirk jî xwest ji van guhertinan sûdê bigre û êrişî Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir.R-5**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1233 | 25-Berfanbar-2024 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

## TEV-DEM; Ji karê keda xwêdanê heyanî pênûsê hembêz dike



TEV-DEM'ê di nava salekê de gelek xebatên pîroz da meşandin, ji bo parastina çand û nirxên şoreşa 19'ê Tîrmehê berpirsyartî girt ser milê xwe û bi erkê xw rabû. Hevseroka TEV-DEM'ê Remziya Mihemed diyar kir ku pêwîste ew xwedî civakeke rêxistinkirî û demokratîk bin û got, "Bi hêviya ev sal bibe sala serkeftin û rêzgarkirina herêma me ji dagirkeran."**R-4**

# PÊWÎSTE HESAB JI KUJERAN WERE XWESTIN

Tevî ku êrişa li dijî rojnamevanan binpêkirina zagon û peymanên navneteweyî ye, lê dagirkeriya Tirk û çeteyê wê li ber çavên cîhanê êrişên xwe yên li dijî rojnamevanan dewam dikin. Êrişên dagirkeriyê dewama polîtîkaya armanckirina nirxên civakê û azadiya çapemeniyê ye. Li hemberî wê jî pêwîste saziyên mafên mirovan yên navneteweyî û saziyên parastina rojnamevanan bi erkê xwe yê exlaqî rabin, bi yek dengî sûcên li dijî Çapemeniya Azad şermezar bikin, di heman demê de hesabê qetilkirina rojnamevanan ji dagirkeriya Tirk bixwazin.**R-3**



## Kar û xebatên salekê yên Şaredariya bajarê Qamişlo



Şaredariya Gel a bajarê Qamişlo ji bo xizmeta gel, îsal bi 522 hezar û 400 dolarên amerîkî zêdeyî 20 projeyan pêk anî. Herwiha şaredariyê bi hemû deste û nivîsgehên xwe, xebatên rojane jî dike. **R-6**

## TEV-ÇAND; Çand û dengê gel e



**Hevseroka TEV-ÇAND'ê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Sumeya Mihemed diyar kir ku ji ber êrişên domdar ên li ser herêmê, gelek astengî di xebatên TEV-ÇAND'ê yên sala 2024'an de derketin, lê tevî van astengiyan wan xebatên xwe bi hêzeke mezin dan meşandin û got, "TEV-ÇAND xwedîderketina li gel e."R-7**

Nûçegihanên jin bi destê DAIŞ û Tirkiyê hatin qetilkirin — Nehîr pale — R-2


Berxwedana Kobanê: 2014 – 2024 — Farûk Sakik — R-5

Tunekirin û înkarkirina Kurdan didome — Zekî Bedran — R-5


Mirov bi civakê heye! — Rohat Bulut — R-6


Li Sûryeya nû nirxên hemwelatîbûnê û rola ronakbîran — Kemal Necim — R-7

# ‘Şervanên YPJ’ê bi rihê Kobanê berxwedanê dikin û rê nadin dagirkeran’

Fermandara YPJ’ê Viyan Soran diyar kir ku ew bi rihê berxwedana Kobanê, li bendava Tişrînê li hemberî êrîşên hovane yên dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê bi îradeyeke xurt têkoşînê dikin û li ber xwe didin.

**Amara Baran/Qamişlo**

Di bendava Tişrînê de bi pêşengtiya şervanên YPJ’ê berxwedaniyeke bêhempa li hemberê êrîşên dewleta tirk û çeteyên wê tê meşandin. Di vê çarçoveyê de fermandara YPJ ‘ê Viyan Soran ji rojnameya me re axivî.

### ‘ YPJ Bi îradeyek xurt di çeperan de li ber xwe dide’

Viyan Soran di destpêka axaftina xwe de wiha got: “Çawa di sala 2014’an de çeteyên DAIŞ’ê bi awayekî hovane êrîşî bajarê Kobanê kir bi berxwedaniya YPJ’ê ew êrîş hatin şikandin. Îro jî şervanên YPJ’ê bi rihê Kobanê li hemberê êrîşên dewleta tirk yên hovane di çeperan de liberxwe didin. Ev jî li giştî cîhanê da isbatkirin ku YPJ’ê bi kîjan rihê li hemberê dewleta tirk û çeteyên wê şer dike. Îro bi pêşengtiya YPJ’ê berxwedaniyekî bêhempa û bi îradeyeke xurt li bendava Tişrînê û qereqozaxê berxwedanî tê meşandin. Dewleta tirk ew teknîka ku pir pê bawere û pişta xwe pê rastkiriye ku hertim li ser çapemeniyê bang dike û dibêje “ emê dagirkeriya tirk û çeteyên wê hemûyan li bendava tişrîn û qaraqozaxê tune bikin wek ku YPG, YPJ û QSD’ê diyarkirin,” ji bo wê jî 14 rojin bê navber êrîşên xwe didomîne, herçiqas hewil bide me tune jî bike û bi teknîka xwe ya herê pêşketî jî êrîş bike, YPJ ‘ê bi berxwedaniya xwe teknîka wê vala derxistiye. Dewleta tirk baş dizane ku cihê ku YPJ’ê têde şer bike û liberxwe bide nikare dagirbike. “

### ‘Dewleta Tirk bi propagandayên şerê taybet dixwaze me bê îrade bike’

Viyan da zanîn ku dewleta Tirk a dagirker di şer de têk çuye, ji ber wê serî li rêbazên şerê taybet dide da ku îradeya şervanan û gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê bişkîne û wiha domand: “Dagirkerî bi propagandayên şerê taybet rojane li ser malper û çapameniya xwe bang dikin û dibêjin ku me bendava tişrînê girtiyê bi vî, rêbazî dixwazin tirsekî bidin avakirin. Lê berxwedaniya YPG, YPJ û QSD’ê propagandayên wan yên şerê taybet vala derxist û êrîşên wan şikand. Pêwîste gelê me ji hêza xwe bawerbe û destekê bide şervanan û li hemberê wan derew û rêbazên şerê taybet hişyarbe û nekeve xefika dewleta tirk.

### ‘Rihê YPJ’ê rihê Kobanê ye’

Viyan anî ziman ku rihê YPJ’ê rihê Kobanêye û wiha pê de çû: “Li kuderê dibe bila bibe em ê hertim bi vî rihê êrîşên dewleta tirk û çeteyên wê têk bibin. Dewleta tirk dixwaze bi rêbazên xwe yên qirêj berxwedaniya ku



li bendava tişrînê tê meşandin têk bibe. Me soz daye gelê xwe em nahêlên ku dewleta tirk bi awayek rihet derbasê axa me ya pîroz bibe. Em wek YPJ’ê bi silogana jin jiyan azadî ya ku li giştî cihanê berbelav bûye didin nîşandin ku çi êrîş ser me de were bila were emê ji hemû êrîşan re bibin bersiv û dewleta tirk nikare rihê me yên ku em dixwazin xwe bigîhînin azadiyê û têkoşîna ku em ji bo azadiyê didin meşandin têk bibin. Ne tenê dewleta tirk çi dewletên navnetewî bin yên ku bixwazin vî rihî bigrin û bifetisînin, emê bi pêşengtiya YPJ’ê vî rihî ji cihanê re bidin nişandan.”

### ‘Rol û misyona jin di şoreşan de girînge’

Viyan wiha domand: “Şoreşa Rojava bi pêşengtiya jina kurd û tevahî jinên cîhanê yên ku bi salane di hundirê xwe de îsyan komkiribûn bi pêşketina şoreşê re û bi avabûna YPJ’ê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê wek volqanekî teqand. Bi berxwedanî û rihê YPJ ‘ê yên ku di sala 2014’an de derket wê demê giştî jinên cîhanê dît ku em wek jin dikarin heta dawiyê berxwedanî bikin. Bi pêşengtiya YPJ’ê jin hin zêdetir bi xwe hesiya û hemû netew di nav xwede hewand bi taybet di nav YPJ ‘ê de ji netewên cûda cûda mirov hene û bi yek rihê li kêleka YPJ di çeperan de şer dikin û berxwedanî dikin, ev jî bandora rihê 2014’an yê ku li Kobanê hat meşandin û heta roja meya îro jî ew rih dimeşe û bandora xwe li giştî cîhanê dike, YPJ’ê da nîşandan ku rol û misyona jin di şoreşan de çiqas bi bandore û jin çiqas dikare pêşengtî bike.

### ‘Bi pêşengtiya jinê êrîş hatin şikandin’

Fermandara YPJ’ê Viyan Soran axaftina xwe wiha qedand: “Li çar parçeyên Kurdistanê û derveyî welat êrîşên ku têne meşandin bi pêşengtiya jinê hatine şikandin li rojavayê kurdistanê de hat somutkirin cihên ku hatina dagirkirin de gelek jinan xwe avêt hembêza YPJ ‘ê ku wan rizgar bike. Jin bere de di nav lêgerînan de ye tu carî ji xwere bindestî qebûl nekiriye bi derketina YPJ’ê re jinê hêza xwe dît û li hemberê desthilatdariyê şerkir. Taybet li bakur û rojhilatê sûriye yê ji netewên kurd ereb suryan û çerkez di çeperan de bi yek rihî bê teredut berxwedanî dikin. Em bang li hemû jinên ciwan dikin ku diwî berxwedaniyê de li kêleka şervanên YPG û YPJ bin û xwedî li axa xwe û welatê xwe derkevin û nekevin bin bandora polîtikayên şerê taybet yên dewleta tirk a dagirker.”



**Ji Pênûsa Jin**

## Nûçegihanên jin bi destê DAIŞ û Tirkiyê hatin qetilkirin

**Nehîr Pale**

Cîhan Bîlgîn yek ji nûçegihanên jin bû ku li hebûna xwe digeriya û dixwest rûmeta xwe biparêz e. Ruhekî wê yê geş hebû ku diviyabû dawî lê neyê. Ew sala 1996`an li bajarê Midyadê yê girêdayî herêma Mêrdîn jidayîk bibû. Yek ji keçên Kurd bû ku dixwest xwedî îrade be û li gorî hest û nêrandina xwe ji jiyanê re, bijî. Di temenekî biçûk de dest bi têkoşîna li hemberî sîstema dewleta Tirk a dagirker û civaka zayendperest kir. Ciyê xwe di saziya belavkariyê de girt ji bo hevrê Cîhan gava yekemîn bû û gava duyemîn jî Şoreşa Rojava bû.
Keça Kurd Cîhan mîna hemû keçên Kurd ji aliyê sîstema dewleta Tirk a dagirker ve dihat tengav kirin, an wê hebûna xwe weke jineke Kurd û welatparêz înkar bike yan jî wê li hemberî sîstema dagirker derbikeve. Ji bo nekeve nava pencên dewletê de jî divê xwe biparêz e, riya têkoşînê hilbijartin rêbazekî herî guncav bû ku hebûna xwe diyar bike. Sala 2014`an dema ku dest bi fakulteya hiqûq dike beşdarî xebatên belavkirina rojnameya Azadiya Welat û Ozgur Gundem dibe. 3`ê salan li Bakurê Kurdistanê xebatên xwe yên belavkariyê berdewam dike. Têkoşîna ku wê destpêkiribû berê wê da Rojavayê Kurdistanê. Eger berê xwe nedabane Rojavayê Kurdistanê ew ê ji aliyê dewleta Tirk ve hatibane girtin û li girtîgehan rizandibane.
Sala 2017`an hevrê Cîhan derbasî Rojavayê Kurdistanê bû. Êdî bi Şoreşa Rojava re dest bi nûçegîhaniya şer kir û xwe da ber berpirsyartiyê. Bi nasnameya nûçegîhana şer tevlî hemû pêvajoyên şoreşê bû. Di kesayeta wê de tişta balkêş ew bû ku wêrekiya wê têrê dikir pey hemû tiştên mereq dike, bikeve. Eger li hemberî rê û rêbazên wê yên tevgerkirine û ferasetên wê yên jiyanê nerazîbûn hebane, dîsa wê hewl nedida ku xwe ji derdorê re isbat bike yan gav paşve bavêje. Nûçegîhaneke ku dawî li lêgerînên wê nedihat, ew jidayîk nebibû ku wê sînordar bikin an jî bê îrade bikin. Ji ber vê yekê xwe herî zêde di şert û mercên şoreşê de da îfade kirin û hebûna xwe diyar kir.
Êrîşên dewleta Tirk a dagirker li ser jinê îdeolojîk in, kîjan jin li hemberî sîstema dewleta Tirk a dagirker derbikeve û dest bi têkoşînê bike, divê wê tine bikin. Niha bi dehan nûçegîhan, rojnamevan, siyasetmedar, dayîk, xwendevanên jin ên Kurd di girtîgehên dewleta Tirk a dagirker de ne. Hevrê Cîhan Bilgîn jî yek ji jinên ku li ser destê dewleta Tirk hat qetil kirin.
Nûçegîhan Cîhan Bilgîn û rojnamevan Nazim Daştan tecawizkirina dewleta Tirk û çeteyên wê ya xaka Sûriyê belge dikirin. Berxwedana şervanan li hemberî êrîşên Tirkiyê û çeteyên wê dişopandin. Ji ber vê yekê roja 19`ê Kanûnê li ser riya di navbera bendava Tişrîn û Sirînê wesayeta wan hate bombebaran kirin û ew qetil kirin. Li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê 33`ê nûçegîhan û rojnamevan bi destê çeteyên DAIŞ û dewleta Tirk a dagirker hatin qetil kirin. Rojnamevan û nûçegîhanên ku şehîd bûn bi pênûs û kamereya xwe Şoreşa Rojava gav bi gav belge dikirin.



# TEV-ÇAND; Çand û dengê gel e

Hevseroka TEV-ÇAND’ê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Sumeya Mihemed diyar kir ku ji ber êrîşên domdar ên li ser herêmê, gelek astengî di xebatên TEV-ÇAND’ê yên sala 2024’an de derketin, lê tevî van astengiyan wan xebatên xwe bi hêzeke mezin dan meşandin û got, “TEV-ÇAND xwedîderketina li gel e.”

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Tevgera Çand û Hunera Netewa Demokratîk a Mezopotamiya (TEV-ÇAND) yek ji tevger hunerî û çandî ye ku di sala 2006’an li Rojava hatiye damezrandin. Beriya avakirina (TEV-ÇAND)’ê bingehek jêr hatibû avakirin ku di salên 80 û 90’î de, çand û huner xwe wekî kom, kom dikir û rojên pîroz ji aliyê van koman dihat pîrozkirin. Beriya şoreşê jî bi vî rengê xebatên hunderî dihate meşandin, lê bi hatina şoreşê ku di sala 2012’an û şûn de, hêdî hêdî navendên girêdayî hunerê hatin avakirin. Sedema ku navendên çand û hunerî beriya Şoreşa 19’ê Tîrmehê tine bûn, ew e ku ji aliyê Rejîma Baas’ê ya wê demê ve dihat qedexekirin, tenê xebatên hunerî bi rengekî veşartî di nava malan de dihat kirin.

### Şoreş ji xebatên hunerî re çirûsk veda

Şoreş ji xebatên çandî û hunerî re çirûzkek veda, êdî bi gavavêtina şoreşê û avakirin sazîyan re, navendê çand û hunerê li seranserî Rojava hatin avakirin. Di sala 2012’an de hin navendên çand û hunerê ji Efrîn heyanî Dêrikê hatin avakirin, di sala 2013’ê piştî ku Serêkaniyê ji çeteyên Cebhet El-Nesra hate rêzgarkirin, li wir jî navend hate avakirin. Navê çand û huner (TEV-ÇAND) bû, li bajar bajar xwe birêve dibir, lê bi avakirina Rêveberiya Xweser li ser asta kantonan hate lidarxistin.

### TEV-Çand li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê xebatê dide meşandin

TEV-ÇAND di destpêka avakirina xwe li ser asta Rojava bû, ji ber hin alanên ku niha hatine rêzgarkirin mîna Tebqa, Reqa, Dêra Zorê û Minbicê, wê demê ji aliyê çeteyan ve dagirkirî bû, lê bi rêzgarkirina van alanan navendê çand û hunerî lê hatin avakirin û heya niha jî xebatên van navendan berdewa me, hem jî wê demê di nava (TEV-ÇAND)’ê de 2 pêkhate tenê hebû, kurd û ereb, lê piştî wê hêdî hêdî her pêkhate cihê xwe di nava (TEV-ÇAND)’ê de girt. Di sala 2019’an de TEV-ÇAND bû ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê û heya û heya niha jî (TEV-ÇAND) li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê kar û xebatê xwe dide meşandin, lê di demê pêş de, dibe ku sîstema vê yekê bê guhertin.

### TEV-Çand dengê gel e

TEV-ÇAND a gelan e, ji navê xwe diyare ku hemû çandan digire



nava xwe û dengê gel e, tevgereke dilxwaziye, hestekî kombûnê ava dike, dengê wê ne tenê di nava Bakur û Rojhilatê Sûriyê de sînordar bûye, lê di nava cîhanê de jî hatiye belavkirin.

### Filklora kilasîk hebûna filklora nûjen e

Heya niha TEV-ÇAND weke tevger xwe birêve dibe, li kêleka wê jî Desteya Çandê, Meclis, Nûnerê Çandê û Tevgera Hîlala Zêrîn hatiye avakirin, herwiha Hunergeha Welat jî di sala 2015’an de hate damezrandin, li kêlekê wê Pargîn jî di sala 2020’an de hate avakirin, Pargîn lêkolîna dengbêjiyê ye, filklorê kevin û veşartî derdixe. Filklora kilasîkî hiştiye ku huner di roja xwe ya îro de li ser piyan be. TEV-ÇAND û bi sazî û tevgerên çandî yên derdora xwe kar û xebatî hevkar didin meşandin.

### Komînên TEV-ÇAND yên ku hatine avakirin wiha ne:

Komîna Sînema ya Rojava di sala 2016’an de li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatiye avakirin û şaxê xwe li kantonan belav e.
Komîna Şano bi navê şehîd Yekta di sala 2016’an de li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatiye avakirin, ev komîn kanton kanton şaxê xwe heye û di bin siya Komîna Şano xwe birêve dibin.
Komîna Muzîkê nêzî salekê bi navê şehîd û hunermend Ebdulmelek li ser asta Cizîrê hatiye avakirin, herwiha li kantonan jî di bin vî nave xebatê muzîkê didin meşandin.
Komîna Govendê di sala 2017’an de bi navê Şehîd Ronahî ku şehîd Ronahî endamekî koma govendê bû, li ser vê bingehê ev nav lê hate kirin, hate avakirin.
Komînên ku nehatine avakirin mîna komîna wêne û peykersaziyê, niha amadekarî ji aliyê TEV-ÇAND’ê ji bo avakirina van komînan tê kirin.
Derbarê kar û xebatên sala 2024’an a Tevgera Çand û Hunera Netewa Demokratîk a Mezopotamiya (TEV-ÇAND), Hevseroka TEV-ÇAND’ê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Sumeya Mihemed ji Rojnameya me re axivî.
Sumeya Mihemed bi van gotinan dest bi axaftina xwe kir çiqasî em kar û xebatên salekê binrxînin, lê wê ne li gorî karê ku tê kirin be, ji ber salek li gorî ev êrişên ku li ser herêma me bê navber tê kirin jî, lê kar û xebatê me nehatin rawestandin û wiha got: “ TEV-ÇAND bi kom, çand û beşê hunerî mîna muzîk, şano, wêne, sînema xwe ava kir. Avakirina TEV-ÇAND’ê ne bi rengekî hesan bû, ji ber siyaseta ku rejîma Baas a wê demê dida meşandin, hemû xebat qedexe dikir, lê TEV- ÇAND bi awayekî veşartî xebat dikir. Ji wê demê heya berî şoreşa 19’ê Tîrmehê TEV-ÇAND’ê xebat di mercên zehmet de dikir. Piştî ku şoreşa 19’ê Tîrmehê dest pê kir, êdî xebata TEV-ÇAND bi coşeke mezin berdewam kir.

### ‘TEV-ÇAND xwedîderketina li gel e’

Sumeya Mihemed diyar kir ku TEV-ÇAND xwedîderketina li gele û wiha got: “Dema ku berhemek muzîkê tê derxistin hestê gel, ax, xweza, lorîka dayikan, kêfxweşiya gel û hwd… derdixe, lewra TEV-ÇAND xwedîderketina li gele û êşa gel bi riya çand û vegotinên dengbêjiyê derdixe pêş. Ji aliyê TEV-ÇAND’ê ve her sal festîval li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê dihat lidarxistin, lê di konferansa me ya ku di sala 2023’an de hate lidarxistin, biryar hate birin ku festîval salekê li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê bê lidarxistin û salekê li ser asta kantonan bê lidarxistin, da ku bi awayekî baş û bêtir amadekarî jêr bê kirin û li ser wê bingehê gelek festîval hatin lidarxistin.”

### Xebatên TEV-ÇAND’ê yê 2024’an

Sumeya Mihemed kar û xebatên ku ji aliyê TEV-DAND’ê di sala 2024’an de hatiye meşandin wiha anî ziman: “Îsal festîvalên ku me weke TEV-ÇAND li dar xist, li ser asta kantonan bû. Festîvala şano li kantona firatê ku li bajarê Kobanê a bi navê şehîd Arîn hat lidarxistin. Festîvala Çanda Netewa Demokratîk li ser asta Cizîrê hat lidarxistin. Festîvalên taybet li Tebqa û Reqa jî li ser asta kantonê hat lidarxistin, lê tevlîbûna komên Cizîrê jî, jêre hate kirin. Di heman demê de, di vê salê de 4 perwerdeyên girtî yên fikrî endamên me yê TEV-ÇAND dîtin, 3 perwerde taybet ji bo pêkhateyên kurd û yek jê ji bû pêkhateyên ereb bû. Ya din jî kargeh çandî hatin lidarxistin, him kargehê şano weke dibistan ji mehkê heyanî 2 mehan hazirtî jêr dihat kirin, şagirt perwerde jêr hat dayîn, di wir de jî lîstok wek şano dihat çêkirin û li bajaran digerandin, 3 kargeh çê bûn, ya muzîk, govend û şano. Armanca wê tevlîkirin û zêdekirina endaman bû.
Di nava salekê de gelek şahî jî hatin lidarxistin, li kêlek wan şahiya hefteya hunerî li dar ket, ew jî di çarçoveya piştgiriya pêngava azadiya fîzîkî ya Rêber Apo bû. Em jî wek Tevgera Çandê kampaniyek ku bajar bajar, konsert lê hate lidarxistin ew jî li ser asta Cizîrê û kantona bû, ev xebat bi hevkariya Desteya Çandê, Meclisa Çandê, Hîlala Zêrîn û TEV-ÇAND bi hev re hate meşandin. Ya herî girîng di vê salê de hate kirin amadekariyê ji bo Peymangeha Hunerî a Bilind ku li bajarê Dêrikê hat vekirin, çar sal amadekarî jêr dihat kirin, ema li gorî rewşê hinek zehmetî hatin kişandin. Îsal bi vekirina vê peymangehê hêzek bû ji bo çandê û her kesê ku niha cihê xwe di nav de digere, di nava wê de nêzî 70 şagirtî ye, di wir de beşê muzîkê, şano, sînema, dibe ku di salê bê de beşê wêne, peykersaz bê avakirin û yê edebiyata jî cihê xwe di nav de bigire.
Ji xwe rojên pîroz jî di riya (TEV-ÇAND)’ê tê pîrozkirin. Herwiha 2 film hatin çêkirin di vê salê de, bi navê “Heval Kekê Min û Birako” bidawî bûne, di sala pêşiya me wê bên weşandin. Ji xwe koma me ya şano ya Şehba tevlî festîvala Kerkokê bû. Hazirtî ji bo festîvala Rojhilat dihat kirin lê ji ber vê rewşê û deriyê li pêşiya me hatiye girtin me nikarî bû derbasî wê derê bibin. Hunergeha şehîd welat jî 24 stran di îsal de qeyd kirin, herwiha 10 stran ji wan bûn kilîp. Ji derveyî Hunergeha şehîd Welat TEV-ÇAND bi xwe jî nêzî 7 berheman çê kirin.

### Ji ber êrişan di xebatê TEV-ÇAND’ê zehmetî dihat kişandin’

Hevseroka TEV-ÇAND’ê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Sumeya Mihemed axaftina xwe wiha qedand: “Plansazî di salên pêşiya me de gelek in, hazirtî niha ji bo stranekê him çîrok û him name ye jî tê kirin. Kar û xebat ne bi rehtî dihatin kirin, bi taybet ev êrişên ku ji her alî ve li ser herêma me tê kirin. Her amadekariyê ku ji bo festîval an çalakiyan çêdibû, bi taybet ê hunerî, zehmetî dihat kişandin. Hazirtî ji bo festîvala Mono Dirama hatibû kirin, ji ber êrişan hate rawestandin, lê di demên pêş wê dîsa bên lidarxistin. Niha sîstem tê guhertin ku wê Desteya Çandê, TEV-ÇAND û Aakademî bibe Çand û Ronakbîrî wê bi vê sîstemê be, ji xwe wê ev sîstem bihata avakirin, lê ji ber rewşê ev yek demikî hatiye rawestandin.”

**Têbînî**



## Li Sûryeya nû nirxên hemwelatîbûnê û rola ronakbîran

**Kemal Necim**

Di şerên navxweyî de, ne tenê gund û bajar wêran didin, ne tenê binesaziya welatan hildiweşe, ne tenê mirov têne kuştin, lê mejî, bawerî, sinc û hest jî hildiweşin. Lewma pêvajoyên piştî bidawîbûna şeran pir caran ji pêvjoya şer bi xwe dijwartir e.
Niha li Sûryeyê rewşeke wiha rû dide, piştî şerekî dijwar ku zêdeyî 10 salan dirêj kir, piraniya welat wêran kir, bi sedhezaran mirov hatin kuştin û girtin û koçbrekirin, niha ew şer heme bêje rawestiya, lê li şûn xwe wêraniyeke mezin di hiş, bîr û mejiyê mirovan de hişt, wêraniyeke ewqas giran e ku dê bi salan bandorê li jiyana xelkên vî welatî bike.
Tê zanîn ku ev tevger weke şoreşeke ji bo azadiyê dest pê kir, li bi destwerdana derve re veguherî şerekî navxweyî yê dijwar, ji ber ku şerê navxweyî bû êdî li welêt her kes xwedî dijmin e, her kes xwînî ye. Eger ev agirê piştî şer di hiş û bîrdanka xelkê de venemire, neyê vemirandin dê welat ber bi şewateke mezin ve biçe.
Di vê mijarê de û vê kêlîka dîrokî de êdî rol dikeve ser milê hişment, aqilmend, zana, ronakbîr û rewşenbîrên welêt ku karibin van birînan bipêçin, li şûna hizrên kîn, nefret, dijberî û tolhildanê, hizrên lêborîn, lihevhatin bû bihevrejiyanê biçînin.
Rejîma Baasê bi salan ev welat bi çewisandin û destpotî û yekalî birêve bir. Ji ber vê rewşa ku bi ti awayî rê nedida derbirîna azad, nirxên mîna hemwelatîbûnê û wekheviya di navbera pêkhateyên welêt de, hatine çewisandin. Ev bandor li hemû beşên civakê bû, di nav wan de beşê civakê yên weke ronakbîr û rewşenbîr têne naskirin. Lewma niha piştî hilweşîna rejîmê pir rewşenbîr û hunermend derdikevin û dibêjin `em newêrek bûn`. Di vê pêvejoyê de, yekî rewşenbîr rabe bêje ez jî li dijî rejîmê bûm, ez jî alîgirên wekhevî û edaletê bûm, wê ti sûdê nede civaka Sûryeyê ya birîndar. Tişta divê bê kirin ew e ku ronakbîrên welêt li xwe vegerin, erka ku dikeve ser milên wan bîbînin û têbighêjin û bibin egera ji nû ve avakirina nirxên hemwelatîbûn, lêborîn û lihevhatinê.
Êrîşeke giran li ser gelên Sûryeyê heye, hin alî dixwazin wan hizrên kîn û nefret û dijberiyê di nava xelkê de gur bikin, civakan, olan, pêkhate û nîjadan bi hev bidin şerkirin. Li hember van hewldanan divê ronakbîr, hişmend û rewşenbîrên welêt ên ji hemû pêkhateyan vê metirsiyê nas bikin û li gorî wê erkên ku dikeve ser milên wan pêk bînin. Ev erkê ronakbîran dualî ye, aliyekî wê mijara şêweyê rêvebirina vî welatî ye ku rê nedin bîr û boçûnên serdestiya yekalî û paşguhkirina mafên sereke yên welatiyan ku dîse welat vegere serdema çewisandin û zordariyê.
Aliyê din ew e ku berê xwe bidin civakê, êş û derd û nexweşiyên ku di encama şer de bûne, bipêçin, nirxên hemwelatîbûn, lihevhatin, lêborîn û bihevrejiyanê belav bikin.

# Kar û xebatên salekê yên Şaredariya bajarê Qamişlo

Şaredariya Gel a bajarê Qamişlo ji bo xizmeta gel, îsal bi 522 hezar û 400 dolarên amerîkî zêdeyî 20 projeyan pêk anî. Herwiha şaredariyê bi hemû deste û nivîsgehên xwe, xebatên rojane jî dike.

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

Şaredariya Gel a Bajarê Qamişlo yek ji saziyên ku bi taybet li ser kar û xebatên xizmetguzarî yên ji bo civakê, kar dike. Şaredariya bajêr wekî her sal pilana xwe ya salane diyar kir ji destpêka salvê kete tevgerê. Hejmarek pirojeyên şaredariyê hebûn ev yek jî li nik xebat û projeyên şaredariyên Girbawî û Tenûriyê.

**Projeyên Qamişlo yên îsal wiha bûn:**

-Li Qamişlo 12 piroje bûn, berferehkirina xeta avê ya Taxa Cûdî bi du cihan, Taxa Hilko, Taxa Şidwan û Taxa Siryan.
-Herwiha cudakirina xeta ava Um Firsan ji du milan ve.
-Hem jî kolandina 20 bîrên avê li hemû stasyonên avê yên bajêr. Di heman demê de paqijkirina korîdorên barê û çêkirina dergehên korîdorên taxên bajêr.
-Ji hêlekê ve meseba Taxa Hilko hat çaksazkirin û gelek korîdorên paqijiyê yên taxên cûda hatin çêkirin.
-Li aliyekî din bi dirêjahiya 2 kîlo mitreyan ji kolanên bajêr bi ziftê hat çaksazkirin.

**Projeyên şaredariya Tenûriyê wiha bûn:**

-3 proje li Tenûriyê pêk hatin, projeyeke avqirêjiyê li gundê Tilzîwan û pirojeke din ya avqirêjiyê li Tenûriyê, herwiha cûdakirina xeta avê û danîna dînemoyekî avê û bikaranîna enerjiya rojê.

**Pirojeyên şaredariya Girbawî wiha bûn:**

-Hejmara pirojeyên vê şaredariyê 4 bûn, jinûveamadekirina xizaneya avê ya gundê Kêstek û Delalê. Hem jî çêkirina rêgarên avqirêjiyê yên gundê Bawii yê biçûk û gundê Gir Sor.
Girêdayî pirojeyên Şaredariya Gel a Bajarê Qamişlo yên îsal jî berdevkê hevserokatiya şaredariyê, Mejdel Betal ji rojnameya me re axivî.

**Rêveçûna kar û xebata şaredariyê**

Di derbarê asta xebata şaredariya Qamişlo de berdevkê hevserokatiya şaredariyê, Mejdel Betal wiha axivî: “Me weke şaredariya Qamişlo, gundê Tenûrî û Girbawiyê projeyên xwe yên sala 2023’an bi dawî kirin. Projeyên sala 2024’an jî di pilanê de bûn hejmara wan zêdeyî 20 pirojeyan bûn. Di heman demê de piraniya projeyan ji bo bilindkirina asta rewşa ava welatiyan bû. Me weke şaredariya Qamişlo ev proje bi dawî kirin, rêjeya diravî ya van projeyan û xebata rojane ya îsal 522 hezar û 400 dolarên amerîkî bûn. Bi hemû deste û ofîsgehên xwe kar û xebat ê rojane dan meşandin. Herwiha hejmara hemû karmendên şaredariyê nêzî 400 kesî ye û nêzî 60 erebe ji bo paqijî, ger û şopandinê hene.”

**Paqijî û ekolojî**

Betal xebata girêdayî paqijiyê wiha nirxand: “Wekî her tim em bi riya deste û ofîsên paqijî û ekolojiyê xebata rojane dikin. Yek jê şopandin û guhdana bi baxçeyên bajêr, darên di navberka riyên bajêr. Îsal me bi hevkariya Desteya Şaredariyan û rêxistinan hezar û 800 dar çandin. Ji bo mijara paqijiya bajêr jî rojane karê paqijiyê heye, me bernameyek ji bo gera nav taxan û komkirina qirêjê derxist, lê astengî derket pêşiya me. Di wan rojên destpêkê de 3 erebeyên ku qirêjê ji bajêr vediguhêzin qirêjgehên derveyî bajêr, hatin şewtandin. Lewma jî lawazî kete karê paqijiyê, li aliyekî din ji bo ku em bikaribin li bajarê xwe xwedî derkevin, me zêdyî 40 selikên çopê li tevahiya bajêr belav kirin, lê welatî bi me re ne alîkar e û di demsala havînê de selikan ji ber bêhna çopê naxwazin. Di heman demê de welatî li paqijiya bajarê xwe nemiqate ne.”

**Tendurstî**

Betal derbarê xebata tendurstiyê bi vî rengî anî ser ziman: “Berî demekê kopratîfê ya Desteya Aboriyê bi alîkariya Heyva Sor a Kurd qirêjgeha Holê ji bo şewtandina bermahiya amûrên tendurstiyê amade kir. Em derzî, sîrom û hemû amûrên tendurstiyê bi rêk û pêk kom dikin û dişewitînin. Ji bilî vê jî gerê me yê şopandinê bi riya karmendên displînê re tên kirin. Hejmara karmendên displînê 42 ye û ew li bazarê digerin. Hem jî li bazara goşt, ya fîkî- şînayî, kelûpelên xwarinê rewşê dişopînin. Di heman demê de jî gerê me yên şopandinê ji bo mijara paqijiyê li xwaringehan çêdibin. Li aliyekî din çi xwarina ku dema bikaranîna wê derbas bûbe, tê girtin û em bi rêbazên cuda xwe jê xelas dikin. Herwiha desteyek ji şaredariyê şopandina hemû nexweşxaneyan dike û tenê bermahiyên tendurstiyê kom dike.”



**Xetên çûnûhatina erebeyan û bazara bajêr**

Mejdel xebata şaredariyê di warê xetên serfîsan û bazara bajarê Qamişlo de wiha axivî:“Ji bo mijara tevgera erebeyên veguhestinê, Ofîsa Veguhestina hundirîn erkdar e. Ofîsa Veguhestinê li ser tevahiya xetên bajêr, xeta Nemetiyê, xeta Elaya û hwd… disekine. Di heman demê de ew li ser teksiyên xetan weke xeta Hilêliyê, Taxa Cûdî û hemû xetên din disekine. Li aliyekî din xebata basên gel di hundirê bajêr de, dide meşandin. Hêjayî bibîrxistinê ye ku berî demekê me xeta basên gel a Girbawî û Tenûriyê jî zêde kir. Herwisa me geracek ji bo erebeyên serfîsan ji bo xetên gundewarên Qamişlo li başûrê bazarê çêkir. Li aliyekî din me îsal 3 bazar li bajarê Qamişlo vekirin. Yek jê li bazara Hetîn ku me gelek berakî ji bo firoşkaran çêkirin. Hem jî me bazara goşt û serjêkirina heywanan ava kir. Li nik vê yekê jî me bazara li ser Pira Bişêriyê veguhezand piştî şaredariyê û berakiyên nû ava kirin.”



## Xwenasîn



### Mirov bi civakê heye!

Rohat Bulut

Di roja me ya îro de civakên Rojhilata Navîn ji ber polîtîkayên oryantalîst ên hêzên hegemon û kapîtalîst wekî li ser sêla sor bin. Bi taybetî jî welat û erdnîgariyên ku şer lê dijwar e.
Di rewşên wiha de barpirsyariyên rêveberiyên herêmî û siyasetmedarên civakê zêde dibe. Bê guman dawîkirina şer û pevçûnan ne hêsan e. Lê ji hêzên parastina gel bigire heta berpirsên siyaset û rêveberiyên civakê divê li gorî rewşên awarte yên şer tev bigerin û civakê bi hişmendiyeke yekpareyî bigihînin. Na xwe dê bedelên giran bê dayîn. Dê parçebûyîn, belavbûyîn, koçberî, birçîbûn û komkujiyên mezin li ser civakan pêk bên.
Di nava şer de pêşxistina polîtîkayên civakî zehmet e. Lê dema ku her kes bi berpirsyariya xwe rabe tu zehmetî jî li holê namîn e. Mixabin bi pêşketina hişmendiya serdest û heta niha her tim şer û pevçûn hebûye. Lê belê li hemberî serdestiyê her tim jî xweparastin pêş ketiye.
Di rewşa şer û xweparastinê de civakbûyîn pêş ketiye. Hişmendiya wekhev û azadîxwaz pêş ketiye. Her tiş di nav hev de pêş dikeve. Hert tiştek xwedî diyalektîk e. Bi qasî şev û rojê, bi qasî tarî û ronahiyê ev heqîqet heye. Ji ber vê jî lazime civak her tim li dijî serdest û şerxwazan di nava têkoşîneke dijwar de be. Lewre şerxwaz û desthilatdar jî ji bo hukmê xwe li ser civakan pêk bîne û mêtêngeriyê pêş bixin li pêşberî gel û civakan di nav hewildanên dijwar de ne.
Di vir de rista rêveberên civakê zêde diyarkar e. Heke rêveberiyên herêmî bi rist û misyona xwe rabin dê karibin civakê jî ji hemû êrîşan biparêzin û her wiha tê hîmên bingehîn ên civakbûyînê zexim bike. Lewma jî pêşengên civakê pêwîste xwedî zanebûn, hişmendiyeke xurt, têr tije bîr û bawerî be ku rê li ber şeran bigire û civakeke têkoşer, berxwedêr û xweparêz ava bike. Bi taybetî ji bo civaka kurd ev jiyanî ye. Heke di Rojhilata Navîn de gelekî ku ne xwedî dewlet be her nikare xwe ji polîtîkayên pişaftinê rizgar bike. Bila şaş neyê fêhmkirin li vir em hebûna dewletekê naparêzim. Lê dixwazim bi vê mînakê balê bikişînim ser polîtîkayên dewletan ên li ser gelên ku dixwazin bi çand, bawerî, ziman û bi nasnameya xwe bijîn û xwe bi rêve bibin ku gelê kurd jî yek ji wan e.
Kêm netew hene ku bêyî statûyeke wan hebe xwe parastibin. Gelê kurd jî yek ji wan e. Gelê kurd hem hebûna xwe diparêze û hem jî têkoşîna azadiya xwe ya bi hemû mafên xwe dide. Ya baş jî xwedî ev hişmendî ye. Lê belê bi polîtîkayên qirêj ên tunekirinê re rûbirû ye. Her çiqas li tevahiya Kurdistanê rewş wekî hev be jî rewşa Rojav niha hêj giran e. Di rewşên wiha de jî pêwîste ew yekgirtiya gel û civakê pêş bikeve ku dikaribe pêşî li êrîşên tunekirinê bigirin. Yek ji nirxên civakî jî ew e ku xwe parastin e. Heke em bixwazin wekî gel û civak bi mafên xwe bijîn divê em jî bi erka xwe parastinê ve rabin. Divê em bikaribin xwe, hebûna gel û civaka xwe biparêzin.
Erdnîgarî û civaka ku li ser wê erdnîgariyê dijî ku ne azad be mirov nikare bi tu awayî behsa azadiya kes jî bike. Kes bi hebûna di nav civak, gel û qewmê xwe de watedar e. Na xwe kesayeta bê nirxên civakî kesayeteke dij mirovî û civakî ye. Ji lewma jî divê em xwe, civaka xwe û axa xwe biparêzin ku em hebin.



# Parêzer Ciwan Îso: Pêwîste sûcdarên hedefgirtina rojnamevanan bên cezakirin

Parêzer Ciwan Îso tekez kir ku hedefgirtina rojnamevanan sûcekî şer e, pêwîste sûcdarên wê bên cezakirin û wiha got: “Bêdengiya sazî û rêxistinên navnetewî li hemberî qetilkirina rojnamevanan jî, rê dide ku dewleta Tirk a dagirker komkujiyên xwe bidomîne.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Hedefgirtina rojnamevanan li gorî biryarên navnetewî yên mafnasî sûcekî dijmirovî ye.
Lê piraniya caran tê dîtin ku rojnameger di rewşên şer û êrişan de, dema karê xwe yên çapemeniyê dikin ew tên armancgirtin û qetilkirin. Nimûneya vê yekê li tevahiya Kurdistanê û bi taybet li Rojava, hem jî Bakur û Rojhilatê Sûriyê li ber çavan e. Li gorî agahiyên di destê me de, ji destpêka Şoreşa Rojava ve heya niha 30 rojnamevan ji wan gelek jin, bi awayên cuda li ser destê dagirkeriya Tirk û çeteyên DAIŞ’ê hatine kuştin. Herî dawî di 19’ê vê mehê de, herdû hevalên me yên rojnamevan Nazim Daştan û nûçegihana ANHA Cîhan Bilgîn li Bendava Tişrînê di encama êrişa balafireke dewleta Tirk a dagirker de şehîdketin.
Herwiha têkildarî hedefgirtina rojnamevanan, parêzer Ciwan Îso ji rojnameya me re axivî.



**‘Bi dirêjahiya şoreş re bi dehan rojnamevan şehîd bûne’**

Ciwan Îso anî ser ziman ku gelek rojnamevanan û kesên sivîl bi dirêjahiya Şoreşa Rojava re hatine hedefgirtin û wiha got: “Ji destpêka kirîza Sûriyê ve dewleta Tirk rasterast destwerdan ji milê siyasî û leşkerî ve di dosiyaya Sûriyê de kir. Ev yek jî da ku dagirkeriya Tirk plan û berjewendiyên xwe di siberojê de pêk bîne. Bi dirêjahiya Şoreşa Rojava re destdirêjî ji hêla dewleta Tirk li ser herêmê hat kirin. Dagirkeriya Tirk û çeteyên wê tu cudahî nekir navbera siyasetmedar, mafnas, rojnamevan û sivîlan. Di şerê Serêkanî, Girê Spî û Efrînê de hem jî bi dirêjahiya Şoreşa Rojava re mafnas, siyasetmeda û bi dehan rojnamevan hatin qetilkirin. Piştî demek dirêj ji kirîza Sûriyê hîna jî em dibînin ku gelê me li ser destê dewleta Tirk û MÎT’ê tên hedefgirtin. Armanca dagirkeriya Tirk jî ew e ku guhertina demografîk, koçberkirin û berferehkirina çarçoveya êrişên dagirkeriyê bide meşandin.”

**‘Hedefgirtina rojnamegeran sûcekî şer e’**

Parêzer Îso destnîşan kir ku hedefgirtina rojnamevanan sûcekî şer e û wiha domand: “Wekî em dizanin ku taybetmendiya karê rojnamevanan eşkerekirina rastiya heyî ji bo raya giştî ye. Berî çend rojan me dît ku êriş li ser du rojnamevanên ANHA’yê hat kirin. Di nemcama êrişa dewleta Tirk a dagirker de ew herdû rojnamevan şehîd bûn. Sîstem û zagonên navnetewî tekez dikin ku pêwîste rojnamevan bên parastin. Ji ber ku karê rojnamevanan dûrî karê leşkerî ye. Lê dewleta Tirk a dagirker bi hovîtî rojnamevanan hedef digire û zagonên navnetewî bin pê dike.”

**‘Pêwîste sûcdar werin cezakirin’**

Parêzer Ciwan Îso gerekdar kir ku pêwîste dewleta Tirk û çeteyên wê bên cezakirin û wiha axivî: “Bêguman



hedefgirtina rojnamevanan sûcekî şer e. Dagirkeriya Tirk û çeteyên wê bê ku cudahiyê bixe navbera tu kesî de, êrişî gelên me dike. Herî zêde rojnameger dibin hedefên êrişan, rêxistinên mafê mirovan û parastina rojnamevanan jî bêdeng in ji van kiryarên dewleta Tirk. Bêdengiya sazî û rêxistinên cîhanî li hemberî dîlgirtin û kuştina rojnamevanan jî dihêle ku dewleta Tirk komkujiyên mezintir di derheqê rojnamevan û hiqûqnasan de pêk bîne. Tişta tê xwestin ew e ku dewleta Tirk û çeteyên wê, li ser asta navnetewî werin cezakirin. Herwiha saziyên parastina rojnamevanan, bi erkê xwe rabin li hemberî rojnamevanên Bakur û Rojhilatê Sûriyê.”

# ‘Felsefeya Rêber Apo bingeha avakirina Sûriyeke nû ye’

**Argêş Vîyan/Qamişlo**

**Serokê Meclisa Rûspî û şêxên êlan ya pêkhateyên Ereb yê bajarê Hesekê Ekrem Mehşûş diyar kir ku ti kes nikare yêkitiya gelên herêmê hilweşîne û wiha got: “Rêveberiya Xweser li ser bingeha Netewa Demokratîk dê dagirkeriyê têk bibe.”**

Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi pêşengiya Kurdan û pêkhateyên din yên heremê jiyan dikin de şoreşa gelan pêşket. Şoreş li ser hîmê projeya Modernîteya Demokratîk ya Rêber Apo pêş ket. Li ser vê bingehê hîn ji destpêkê ve çîrûska xweseriyê pêxist. Bi gelek xort û keçên herêmê mil dan mile hev axa xwe hemberî dagirkeran parastin.
Di derheqê yekitiya gelên Sûriyê û ji bona hevgirtina gelan ya pêşeroja Sûriyê de nûnertiya gelên herêmê bê kirin, Serok Meclisa Ruspî û şêxên êlan ya pêkhateyên Ereb yê bajarê Hesekê Ekrem Mehşûş ji rojnameye me re axivî.

**‘Rejîma Baas ti caran nûnertiya gelê Ereb nekir’**

Ekrem Mehşûş anî li ser ziman ku piştî şoreşa gelan ya 2011’an de, serdemek nû ji bona gelan ava bû wisa dest bi axaftina xwe kir “Serdema sala 2011’an gelê Sûriye de jiyan dikir bi tewahî nav xeterî û metirsîyek mezin bû. Di nav



hişmendiya Rejîma BEES’ê ya yêk al yêk netew yêk ziman de hatibûn hiştin. Rejîma BEES’ê ti caran nûnertiya gelê Ereb yên Sûriye nekir. Armanca wî tenê dirêjkirina desthilatiya wê bû. Gel her tim bi dirûşmeyên ‘Rejîm bila hilweşe’ her tim di nav zimanê gelê herêmê dihat bihîstin. Lê ji ber metirsiya jîyanî ev dirûşme nekarîbûn bikin girseyi. Ev xwasteka gel, li piştî sala 2011’an Rêberê Netewî yê hemû gelan Rêber Apo ev pêvajo wek ‘Bihara Gelan’ pênase kirye, destpêkir. Di wan serdema aloziyan de gelek komên çekdarî û rêxistinên ne ji Sûrî ne û mafên gelên Sûriyê neparastin derketin qadan û hewildan kirin ku ji bona sûd ji nakokîyên li holê werbigirin. Lê tenê nûnerên gelê Sûriyê hêzên ku hemû pêkhateyên Sûriyê pêk tên weke PYD, QSD’ê û YPJ’ê serkeftin bi destxistin. Piştî ev qas hewildana li Sûriyê pêwajoyek nû destpêkir. Di meha Mijdara 2024’an êrişên çeteyên girêdayî dewleta Tirk ya dagirker li ser destpêkê li ser bajarên weke Helebê, Şehba û Til Rifet destpêkir. Hêzên girêdayi Rejîma BEES’ê bê ku berxwe bidin çeperên hiştin hin revîyan hin jî radestî çeteyan bûn. Ji ber wê pêşîya komên çekdar yên weke HTŞ’ê û komên din yên girêdayî dewleta Tirk ya dagirker bajarên Sûriyê dagirkirin. Himsê, Idlîb, Deraa û herî dawî jî paytexta Şamê hate bi destxistin. Bi wê rojevê pêvajoyek bû axa Sûriyê giştî de destpê bû. Ev çeteyan li wan deran gelek kiryarên xêrab li serê gelê herêmê de anîn. Taybet ji bona gelê ola qirkirin û komkujiyan de derbas kirin. Gotinên van komên çete cûda ne, kiryarên wan cûda ne. Gelê Şamê jîyan dikin, piştî komên çetederbasî li wir bûyin metirsiyek mezin jiyan dikin. Ev komên çete selefî ne û hişmendiya çeteyên DAIŞ’ê xwe tevger dikin. Ev komên çete bajarên hatine dagirkirin pir kiryarên qirêj pêkanîn. Ev komên çete ne tenê hemberî gelê Kurd di heman demê de, Mesihî, Siryan, Ermen û pêkhateyên Ereb jî di zextê de derbas dikin. Sûriyê tevahî bin dorpeçekî piralî da bû. Gelê Sûriyê bi koçberî re, rûbirû hat hiştin. Ev ne hêvîya gelê Sûriyê bû. Lê piştî ruxandina rejîma Bees ve xeyalên xweserî yên gelê Sûriyê mezintir bûn. Hat xuyakirin ku modela pêkane ya gelên herêmê pergala Rêvebêriya Xweser e.”

**‘Rêvebiriya Xweser hemû pêkhateyên Sûriyê dinav xwe de, dihewîne’**

Mehşûş got hêzên desthiladar hene, yên ku heznakin yêkitiya gelan ava bibe û plansaziyên xwe xistine merîyetê û wisa domand: “Ev 14 salin Rêveberiya Xweser hatiye damezirandin. Her sazi û dezgehên Rêveberiya Xweser de, di welatiyên hemû pêkhateyan pêktên kar û xebat bi hevra dikin. Pergala Rêveberiya Xweser pergala rêvebirina hemû gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û tevahî Sûriyê ye. Rûxmê ku bêderfetî astengî û êrîşên dagirkeriyê jî, ji bona xizmet guzariya gelê herêmê kar û xebatên xwe bêsekin didin meşandin. Rêveberiya Xweser wek pergal ne wek pergala dewletê ye. Ji ber nîzama Bees’ê ji bona gelê Sûriyê ti xizmet nekirin. Gelê Sûriyê hertim bin metirsiya qirkirinê de bûn. Di heman demê de, komên çete yên girêdayî dewleta Tirk ya dagirker jî di wê rewşê xêrabtirin. Di kiryarên komkujî û qirkirin, dizî, talan hwd. dimeşînin. Ti caran nikarin nûnertiya gel bikin. Nûnertiya pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê Rêveberiya Xweser û Netewa Demokratîk e. Rêveberiya Xweser ne desthiltdarî ye, ne jî otonom e , pergala ku ji bona mirovahiyê û gel kar dike ye. Rêveberiya Xweser amadeye ku li Sûriyek nûve hatiye dizaynkirin de, nûnertiya hemû gelan bike. Di her sazî û dezgehen xwe ve, ti caran bê ku cudahî bê kirin, xebatên xizmet guzarî da meşandin. Welatiyên ku bajarên dagirkêrî jiyan dikin, her tim bi mere dikevin peyvendîyê û dibêjin ‘Werin me xêlas bikin, ev çeteyên hov dê me qirbikin.’ Hevîya me eve wek eşîrên gelê Ereb tevahî Sûriye bi pergala Rêveberiya Xweser bê rêvebirin.”

**‘Ol û eşîrên li herêmê keleka hêzên parastinê û Rêveberiya Xweserin’**

Mehşûş bibîrxist ku ti kes nikare yekîtiya gelan xêrab bike û axaftina xwe wisa bi dawî kir: “Piştî hatina komên çete yên girêdayî dewleta Tirk ya dagirker hewildan kirin ku di navbera gelên Kurd û Ereban de alozî û nexweşîyê ava bikin. Lê gelek caran êlên pêkhateyên Ereb yên navdar daxuyanî dan û gotin ti kes nikare yekitîya gelan ya bi salan ava bûye xêra bike. Em her tim li gel hêzên xwe yê parastinê QSD, YPJ’ê û Rêveberîya Xweser re ne. Em ti carî pey doza Sûriyê bernadin. QSD de wek gelê Ereb pir zarokên me hene û şehîd bûne. Gelê Ereb jî, wek gelê Kurd hertim di aliyê dagirkeran ve, hatiye tine hesibandin. Bangawziyamin ji bona hemû pekhate, êl û gelên ku Sûriyê de jiyan dikin, di hemberî çeteyan û hemberî dagirkeran em yekitîya xwe ava bikin û nehêlin biratiya salan xêra bibe.”

# TEV-DEM; Ji karê keda xwêdanê heyanî pênûsê hembêz dike

TEV-DEM'ê di nava salekê de gelek xebatên pîroz da meşandin, ji bo parastina çand û nirxên şoreşa 19'ê Tîrmehê berpirsyartî girt ser milê xwe û bi erkê xw rabû. Hevseroka TEV-DEM'ê Remziya Mihemed diyar kir ku pêwîste ew xwedî civakeke rêxistinkirî û demokratîk bin û got, "Bi hêviya ev sal bibe sala serkeftin û rêzgarkirina herêma me ji dagirkeran."

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Ji bo rawestana li himber astengî û metirsiyên ku civak ji aliyê modernetiya kapîtalîst û netew-dewletê ve rû bir û dima, pêdivîyeke mezin bi rêxistineke ku beşên civakê zane û birêxistin bike hebû. Dewlet li ser bingehê avakirina keriyên bê çare dixebitin, lewra pêwîtî hebû ku rêxistineke ferdê têgihiştî yê rêxistinkirî ku maf û erkên xwe li himber xwe û civaka xwe dinase hebû, ev ferdê jî xwe dispêre demoqrasî, azadî û wekheviyê, li ser vê bingehê Tevgera Civaka Demokratîk TEV-DEM'ê di 3 Tîrmeha 2011'an de hate avakirin. TEV-DEM'ê pêwîstiyeke dîrokî û hemdemî bû, bi rola avakerê şoreşa 19'ê Tîrmehê rabûye.

**TEV-DEM yek ji hêzên sereke li Sûriyê ye**

Damezirandina TEV-DEM'ê di asta bersiveke xurt li ser hemî hewildanên peydakirina cudabûnê di nava civakê de bû. Tevgera Civaka Demokratîk ji bo pêkanîna avakirina civakeke exlaqî- siyasî û ekolojîk xebat kiriye û di têkoşîna xwe de, azadiya jin bingeh girtiye. TEV-DEM'ê di konfedraliya rêxistinên civaka demokratîk de serekey e, herwiha di têkoşîna xwe de pirensîpa jiyana hevbeş û wekhev di navbera hemû çand, gel û baweriyên olî de, bingeh girtiye. Rola TEV-DEM'ê ne tenê di çarçoveya herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê de maye, lê di heman demê de bû hêzeke sereke û girîngî di tevahî Sûriyê de.

**TEV-DEM'ê kevirê bingehîn di damezirandina Rêveberiya Xweser de ye**

TEV-DEM'ê li ser yekkirina helwestên siyasî yên hêzên kurdî, bi rêya têkiliyên berdewam ên bi hêz û beşên civakî re li ser yekkirina refên hêzên civakî û siyasî di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de xebitiye û ji bo vê yekê çi li ser asta hundirîn be û çi jî li ser asta derve be, çend peyman li dar xistiye. TEV-DEM'ê bi destpêkirina şoreşa 19'ê Tîrmeha 2012'an re, xwedî roleke pêşeng û aktîv bû, di rêxistinkirin û pêşengtiya şoreşê de û beşdariyeke rastteqîne di avakirina pirojeya Rêveberiya Xweser ya demokratîk de li Sûriyê xebat kiriye. Herwiha TEV-DEM'ê pirên hevgihîna di navbera hemû pêkhateyên civakî, çandî, eşîrtî û siyasî de ava kiriye û bi vî rengî rewşa rêxistinî di nava projeya Rêveberiya Xweser de, xurt kiriye. TEV-DEM'ê bi rêya avakirina komîn, meclis û malên gel ve li ser kontrolkirina rewşa ewlehî û xizmetguzarî di herêmê de tevgeriya ye û kevirê bingehîn di damezirandina Rêveberiya Xweser de ye. Tevgera Civaka Demokratîk TEV-DEM'ê doza azadiya jin, dozeke bingehînin yên ku civak êşa wan dikşîne dibîne, lewra ji avabûnê û heta roja îro roleke li pêş ya jinê girtiye nava xwe, herwiha xwedî roleke giringbû di pêşxistin û bicîkirina pirensîpê Sîstema Hevserokatiyê di komîn û meclisan de.

**TEV-DEM girîngiyê dide rêxistina civakê**

Tevgera Civaka Demokratîk ji bo avakirina civakeke demokratîk, girîngiyeke mezin dide rola ciwanan, lewra piştgiriya rêxistin û yekîtîyên ciwanan dike. Herwiha ji ber ku hişmendî û rêxistinbûna çandî, demokratîk û civakî yekane rêya avakirina civakeke xwedî nirxên exlaqî- siyasî ye, lewra TEV-DEM'ê giraniyê dide rêxistinkirina hemû pêkhate û beşên civakê, bi rêya yekîtî, rêxistin, ode û meclisên ku nûnertiya beşên herî mezin ên civakî dikin, di heman demê de bi rêya akademiyan, endaman perwerde dike û wan ji milê fikrî û pîşeyî de pêş dixe.

**Kar û xebatên TEV-DEM'ê**

Tevgera Civaka Demokratîk têkoşîna ji bo bidestxistina jiyaneke azad û birûmet a komên civakê, bi destxistina pêşketina civakî, aborî û bilindkirina karîgeriya hilberînê li gel piştgiriya bîrdoziya demokratîk, exlaqî û siyasî, parastina maf û azadiyan armanc dike ew jî bi rêya:

-Pêşxistina hevgirtin û hevhimbêzkirin a di navbera pêkhateyên civakê û çandên wan yên cihêreng de, weke bingeh ji bo têkoşîna xwe digire dest.
-Garantîkirin û parastina azadiya jinan û parastina mafên wan di hemû warên jiyanê de.
-Piştgirî û pêşxistina rola ciwanan di civakê de û ji têkoşîna wan a demokratîk re, piştgirî ji plan û projeyên wan re.
-Pêşxistin û parastina azadiya mafên rêxistinên civaka demokratîk û piştgiriya wan bi hemû rêbazên rewa.
-Hewldan ji bo garantîkirina mafê kar, afirandina derfetên wekhev û pêşdebirina navgînên hilberîna civakê û pêşxistina wê bi riya perwerdeya pîşeyî û akademîk.
-Di nava komên civakê de zanekirina bi têgeha edalet û wekheviyê û di çarçoveya konfedraliya rêxistinên civaka demokratîk de ronîkirina rola wê di xizmeta berjewendiyên giştî de û pêwîstiya bi destxistina dadmendiya civakî ve.
-Piştgiriya veguherîna demokratîk.
-Beşdarbûna di standina biryarên di xizmeta civakê de.
-Xebat ji bo hevgirtin û hemahengiya di navbera rêxistinên civaka demokratîk de û ji aliyekî din ve jî di navbera endamên wan rêxistinan de.
-Xebat ji bo çareserkirina kêşeyan bi rêyên aştiyane.
-Xurtkirina girêdanên biratî, hevkarî û yekîtiyê di nava rêxistinên civaka demokratîk de.
-Hevkariya bi rêxistinên civaka demokratîk û yekîtîyên herêmî û navneteweyî re.
-Têkoşîn ji bo vegera koçber û penaberan li mal û warên xwe.
-Pêşxistina proje û komeleyên aborî yên civakî.
-Parastina mafên zarok, kesên bi temen mezin û kesên xwedî pêdiviyên taybet.
-Belavkirina çanda jîngehê di civakê de û piştgirî û pêşxistina pirojeyên ku parastina wê dikin.

Li ser asta Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê 21 yekîtî, meclis û rêxistinên girêdayî TEV-DEM'ê ne, herwiha li her kanton û bajarekî li gorî pêwîstiya wê, yekîtî lê hatine avakirin.

**Navê yekîtî, meclis û rêxistinan jî wiha ne:**

-Yekîtiya Kedkaran.
-Yekîtiya Endizyaran.
- Yekîtiya Ajokaran.
- Yekîtiya Bijîşkan.
- Yekîtiya Bijîşkên Diranan.
-Yekîtiya Dermansazan.
-Yekîtiya Pîşeyên Tenduristiyê.
-Yekîtiya Pîymankaran.
-Yekîtiya Mamostan.
-Yekîtiya Rewşenbîran.
-Yekîtiya Parêzeran.
-Yekîtiya Wênekêşên fotografî ya Sûrî.
-Yekîtiya Odeyên Pêşesazî.
-Yekîtiya Odeyên Bazirganî.
-Yekîtiya esnafan.
-Yekîtiya Cotkaran.
-Yekîtiya Endezyarên Çandiniyê.
-Rêxistina Rojava.
-Rêxistina Mafên Mirovan.
-Mala Êzdiyan.
-Meclisa Ermeniyan.

**Ofîsên ku di nava Tevgera Civaka Demokratîk de cih digirin wiha ne:**

Ofîsa Jin, Ofîsa Têkiliyên Diplomasî, Ofîsa Hiqûqî, Ofîsa Erşîf û Ragihandinê, Ofîsa Rêxistinî, Ofîsa Ciwanan, Ofîsa Perwerdekirin û Hişyarkirinê, Ofîsa Darayî û Ofîsa



Lêkolîn û Projeyan, herwiha dibe ku li gorî pêwistî û pêdiviyên xebatê dibe ofîsên nû vebin.

TEV-DEM'ê di nava salekê de zêdeyî 50 civîn, semîner, daxuyanî û pîrozbahî li dar xistiye.

Derbarê Kar û xebatê Tevgera Civaka Demokratîk TEV-DEM'ê yê sala 2024'an, Hevseroka TEV-DEM'ê Remziya Mihemed ji rojnameya me re axivî.

Remziya Mihemed diyar kir ku TEV-DEM'ê hemû beşên civakê digire nava xwe û wiha got: "TEV-DEM'ê ji meha despêka sala 2024'an heya meha Tebaxê amadekariyên kongrê xwe yê 5'emîn dikir. Di reşnivîsa rêziknameya TEV-DEM'ê de guhertinên pêwîstin ên di hin xalan de, li gorî salên derbasbûyî û pêş, di kongrê de hatin erêkirin. Di heman demê de ji bo derbasbûna di hundir kongrê de, amadekariyên xurt bi lidarxistina civînan û rêxistinkirina yekîtiyan di hundir kantonan de hate kirin. Ji xwe biryara herî girîng di kongrê de ew e ku xebatê bi salane li ser bingeha wê bê meşandin, pêşxistina pêngava azadiya fîzîkî ya Rêber Apo ku di vê pêngavê de taybet wekî parêzer di milê hiqûqî de karibin parezvanê Rêber Apo bin. Herwiha yekîtiya parêzerên TEV-DEM'ê, di endamitiya Insyatîva Azadiya Rêber Apo de cihê digrin û tevlî hemû çalakiyên di çarçoveya pêngava azadiya fîzîkî ya Rêber Apo dibin."

**'Wê di demên pêş Meclisa Jin bê avakirin'**

Remziya Mihemed da eşkerekirin ku wê di demsala Buharê de Meclisa Jin bê damezrandin û wiha got: "Di nava xebatên TEV-DEM'ê de, li hin cihên ku jin ji bo avakirina sîstema hevserokatî, li gor projeya Neteweya Demokratîk temam bibe, li ser tê seknandin. Ji bo avakirina xurtiyekê di yekîtiyan de hîn bêtir li pêş bixînin, pêwîste herdû nerîn derkevin pêş, di vî alî de lewazî hebû, lê dem bi dem ev yek tê derbaskirin. Li gor Hevpeymana Civakî ji bo ku em xwe birêxistin bikin, da ku nerîneke xurt di aliyê tevgera jin de bê derxistin, pêwîste ofîs û hevserokên jin ên Civaka Demoratîk xwe wekî Meclis bidin avakirin, ev biryarê kongrê ye, niha jî li ser bingehê wê amadekarî tên kirin û li gorî biryarê di demsala Buharê bê lidarxistin. Di nava xebatên me de jî ya girîng ew e ku hêza ciwanan xurt bikin. Herwiha ji bo em têkiliyên xwe yên diplomasî li pêş bixin di hundir û derveyî welat de, gelek têkilî hatin kirin, da ku projeya Neteweya Demoratîk li her deverê bê belavkirin. Di salên çûyî damezrandina kongra konfedraliya rêxistinên civaka demokratîk hat lidarxistin, TEV-DEM'ê endamê wê bingehîne ji sedî 60 cihê xwe di nav digire, xurkirina vê konfedraliyê jî biryarê kongirê ye."

**'TEV-DEM'ê hemû beşên civakê dihewîne'**

Remziya Mihemed di berdewamiya axaftina xwe de diyar kir ku pêwîste yekîtiya kurdî bê avakirin û wiha got: "Gelek pisgirêkên ku navxweyî tên jiyankirin. Ji bo lidarxistina kongrekî navnetewî kurdî ku yekîtiya kurdan bike, em weke TEV-DEM'ê endamê wê sereke ne, armanca wê ew e ku bi yek deng û hêzê li hemberî êriş û gefên ku li ser me tên meşandin, bisekinin. Ji bo proja Neteweya Demoratîk birêve bibin û pêş bixin, pêwîste yekîtiya kurdî bê avakirin, ji bo wê em TEV-DEM'ê endamê sereke ji bo hazirkirin kongrekî li Rojavayê Kurdistanê ye. Em xwe berpirsyar dibînin ji bo avakirina mala kurdî, ji ber rêxistinbûyîn di hundir civakê de ava nebe, wê partiyên siyasî nikaribin gavên xurt bavêjin, ev jî biryarê kongrê bû. TEV-DEM'ê di tevahî meclisan de cih digirin, ji ber hemû beşên civakê di nav xwe dihewîne û wê girêdana civakê bi riya meclisan be, di heman demê hemû çalakiyên ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê meşandin, bi xurtî cihê xwe di nav de digire. Xebatên rêxistinî ji bo ku biserbikevin, yek ji xalên sereke sîstema perwerdê ye, lewra di vê salê de Akadimiya Civaka Demoratîk 3 dewreyên xwe yên girtî derbirin."

**'Herêmên xwe ji dagirkeriyê rêzgar bikin'**

Remziya Mihemed axaftina xwe wiha qedand: "Her xebatek bê meşandin wê astengî li pêşiya wê hebin, ji ber şerekî taybet û êrişên li ser me tên kirin, dixwazin bibin kelem li pêşberî xebatên me, lê em dema rêxistina xwe pêk bînin wê hemû astengî rabin. Bi giştî li ser vê bingehê xebatên TEV-DEM'ê di vê sale de hatine meşandin û bi hêviya salên pêşiya me salên serkeftî ji bo tevahî gelê Rojava bin û herêmên xwe ji dagirkeriyê rêzgar bikin."



# 'Armanca dagirkeriya Tirk derxistina tevliheviyê di nava pêkhateyên herêmê de ye'

Rojnamevan Refîq Ibrahîm diyar kir ku bi rûxandina rêjîma Eseed re guhertinên bingehîn di Sûriyê de pêk hatin. Dagirkeriya Tirk jî xwest ji van guhertinan sûdê bigre û êrişî Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir. Ibrahîm da zanîn ku armanca dagirkeriya Tirk derxistina tevliheviyê di nava pêkahateyên herêmê de ye.

**Dîlan mulhim/ Qamişlo**

Piştî rûxandina rêjîma Esed di 8'ê Mijdara 2024'an de, rûpeleke nû di dîroka gelên Sûriyê de hat vekirin, herwiha guhertinên bingehîn di rewşa Sûriyê de pêk hat.

Di derbarê geşedanên dawî yên Sûriyê, herwiha êrişên dagirkeriya Tirk û çeteyên wê li ser gelên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, rojnamevan Refîq Ibrahîm ji rojnameya me re axivî.

**'Rûxandina rêjîma Baas bi hevkariya hêzên navneteweyî pêk hat'**

Refîq Ibrahîm di destpêka axaftina xwe de wiha got: "Amedekariyên hikûmeta Suriyê ya berê û Rûsyayê hebûn ku êrişî li ser bajarê Idlibê bikin, lê ev yek neçû serî. Dewleta Tirk a dagirker ji vê rewşê sûd girt û êrişî kir ji bo ku armanca xwe pêk bîne. Amedekarî ji bo van êrişan hebûn ne tenê bi destê dewleta Tirk bû, lê dewleta Tirk roleke mezin di vê rewşê de lîst. Lê xuyaye ku erêkirina Rûsya, Emerîka, Birîtaniya û Israyîl hebû ku ev êriş çêbibe, ji bo ku rêjîma Baas birûxînin. Rewşa ku li Sûriyê çêbû rejîma Baas di ber de berpirsyare û ew sersebebê tiracediya ku hatî jiyan kirine. Ji ber ku rêjîma Baas bi erkê xwe ranebû. Herwiha biryar ne



biryara rêjîmê bû, biryara Îranê bû û her kesî xwest ku xwe ji Îranê dûr bixe, lê rêjîma Baas xwe ji Îranê qut nekir û cîhanê bi giştî êrişî Îranê kir, ji bo ku Îranê ji Surî derxin."

**'Pêwîste dewltên cîhanê bi erkê xwe rabin'**

Refîq Ibrahîm wiha axaftina xwe domand: "Dewleta Tirk û çeteyên wê xwestin ji giştî rewşa Sûriyê Sûdê bigrin û êrişê herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bikin. Di destpêkê de êrişî herêma Heleb kirin û koçberên Efrînê yên ku li Şehba diman careke din bi dare zorê koçber kirin. Dagirkeriya Tirk xwest tevahiya herêma helebê bike bin destê xwe de. Ji ber ku em dibînin ku Erdogan dibêje ku ew li Minbicê naseknin û wê êrişên xwe li ser heremê berdewam bikin û heyanî 35 km derbasî tevahiya herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bibin. Di heman demê de ev pilana wan berdewame, ji ber di dema niha de rewşa Minbic nebaşe û metirsiyeke mezin li ser pêkhateyên herêmê hene, bi taybet niştecihên kurd. Çeteyên girêdayî dewleta Tirk gelek dikan şewitandin û malên welatiya bûn, gelek işkence û sûcên dijmirovî li ser welatiyan pêkanîn. Herwiha bajarê Minbic di dema niha de vegeriya dema ku çeteyên DAIŞ'ê dagirkirbû. Dewleta Tirk armanca wê ewe ku şerê Sûriyê dewam bike û aramî çênebe."

**'Çareserkirina pirsgirêka Sûriyê di aliyê siyasî de ye'**

Rojnemevan Refîq Ibrahîm da xuyakirin ku di vê rewşa awarte de pêwîste pêkhateyên herêmê destekê bin ji bo ku van pilanan vala derxin û axftina xwe wiha bidawî kir: "Armanca dewleta Tirk a dagirker ewe ku fitneyê di nava pêkhateyên herêmê de derxîne û guhertina demogirafîk di serî de li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û tevahiya sûriyê pêkbîne. Herwiha dixwaze ku gelê heremê koçber bike û planên xwe yên gemar li herêmê pêk bîne. Pêwîste pêkhateyên heremê bi giştî agehdarê van planên xeternak yên dagirkeriya tirk bin û li hemberî wê tevdîrên xwe bigirin. Herwiha ji bona ku em karibin çareseriya alûziya Sûriyê tevahî pêkbînin, pêwîste ku sistema rêveberiya xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bona çareseriya alûziya tevahiya sûriyê bibe bersiv û nimûne. Di derheqê kiryarên dagirkeriya Tirk ku di derheqê gelên heremê de pêktîne pêwîste pêşiya wê were girtin û dagirkeriya tirk were dadgehkirin. Ji bona pêşeroja sûriyê pêwîste ku hemû hêzên li ser erdê şer û pevçûnan rawestînin û dest bi danûsitandina bikin û ji bona ku rêveberiyeke hevbeş were avakirin bikevin nava kar û xebatê de.

Herwiha pêwîste ku doza kurdî were çareserkirin û destûrek nû li Sûriyê were danîn. Bi tevlîbûna hemû pêkhateyên herêmê û gavên ku HTŞ ê li Şamê pêk anîne li gor rewşê gavên başbûn. Dema hikumeta demkî heta 1'ê Adarê ye û di van her sê mehan de divê nêrînên gelên Sûriyê werin sitandin. Hiqûqê netewa kurd were tesbîtdkirin û di destûra Sûriya nû de azadî, demukrasî û dewleta Surî ne navendî çêbibê û bi çi rengî gelê Sûriyê li hev bikin, divê mafê gelê kurd di Sûriya nû de were misogerkirin. Herwiha ku mafê gelê kurd û pêkhateyên din di pêşeroja Suriyê de neyê misogerkirin wê alozî berdewam bin û şerekî navxweyî derkeve. Ya girîng ewe ku gelên herêma Bakur û Rojhilatê Suriyê li destkeftiyên xwe xwedî derkevin, di vê her kes baldar be û her kes xwe berpirsyar bibîne di ber parastina gel û destkeftiyên Rêveberiya Xweser de."

## Tunekirin û înkarkirina Kurdan didome



**Zekî Bedran**

Yên ku Tirkiyê rêve dibin ji bo bê statû û bê nasname hiştina Kurdan li derve û hindirê welat de çi ji destê wan tê dikin. Di Şerê Cîhanê yê yekemîn de Kurd ji aliyê 4 dewletan ve hatibûn dabeşkirin, ber bi tunebûnê û rêwitîyeke tarî ve hatibûn şandin. Di bin pencê komkujiyên çandî û helandinan de Kurdan xwe gîhande vê rojê. Niha Tirkiye di Şerê Cîhanê yê Sêyemîn de jî, ji bo Kurdan heman kiryaran re rûbirû bihêle çi destê wê tê dike. Yên wek Bahçelî dibêjin ''Bila Ocalan were meclîsê de biaxive û rêxistinê tasfiye bike.'' Di heman demê de di Rojava de ji bo Kurdên Başur û Rojhilatê Sûriyê tune bikin, vîna wan bişkînin û radest bigrin lez dane êrîşên xwe. Yên ku li Tirkiyê ji bo Kurdan tiştên baş difikirin, qaşo rêbazên aşitîyane pêşniyar dikin, ma gengaze li Rojava Kurdan re ewqas dijminatiyê bikin?

Rêvebiriya Erdogan ruxmê hemû rexneyên muxalefetê jî di Sûriyê de alîkarî da HTŞ, DAIŞ û çekdarên din. Tirkiyê ruxmê dijberiya Îran û Rusyayê jî piştgirî da HTŞ'ê. Dema ku Rejîma Baas'ê ya ku hindirê wê vala hilweşiya Erdogan û mirovên wî xwe wek xwediyê hemû Sûriyê dîtin. Şam zivirandin wek mala xwe. Ji bo ku rêvebiriya nû bikin di bin serweriya xwe, tevlî polîtîkayên xwe bikin helwestekî çors û pozbilind nîşan didin. Pêwîstiya HTŞ'ê ya revakirin û piştgirîya derve heye. Jixwe Sûriyê welatekî giran birîndar e. Kombuyîn û sererastkirina wê hêsan nîne. Tirkiya dixwaze vê yekê wek firsendekî bi kar bîne û Sûriyê bike di bin mêtîngeriya xwe.

Ji aliyê hemû cîhanê ve ji bo bêdengkirina çekan û bi guftûgo ve çareseriya pirsgirêkan bangawazî tê kirin. Lê Tirkiye berovajî dike. Komên çekdar ên ku di bin navê SMO'yê de rêxistin kiriye û diajo li ser Kurdan. Rejîm hilweşiyaye ji ber vê divê hemû hêzên muxalîf tevlî pêvajoya sîyasî bibin û lêgerîna çareserkirina pirsgirêkan ya aşitîyane de bin. Lê dema ku dor tê Kurdan çekê dispêrin li ser patika wan. Artêşa SMO'yê qaşo xwe wek muxalefeta Sûriyê hikûmeta demkî eşkereyê raya gel kirîbû. Lê derket holê ku tu eleqeya xwe mûxalefeta Sûriyê re nîne. Di destê dewleta Tirk ve wek hêzeke êrîşê ya li ser Kurdan hatiye rêxistin kirin. Çi pirsgirêka SMO'yê ji Kurdan re heye? Kurd li Sûriyê deshilatdar nînin û erîşên kesî nekirine. Ev heremên ku di tê de jiyan dikin de bi hemû gelan re pergaleke demokratîk avakirine û jîyaneke hevpar dijîn. Bi hevkariya hêzên Hevpeymana Nav Dewletî li dijî DAIŞ'ê di nava têkoşînê de ne. Di heman demê de ji bo Sûriyê ya nû de cihgirtinê û tevlêbûna karê ji nû ve avahîsaziyê re jî amade ne.

Di destê Tirkiyê de amûreke ku li dijî Rêvebiriya Xweser û Kurdan bi kar bîne nemaye. Derveyê vê, hêzên bibandor yên hemû cîhanê jî didin xuyakirin ku divê hebûna Kurdan were qebûl kirin û tevlî Sûriyê ya nû bibin. Tirkiye jî eşkere nikare bêje ez li dijî Kurda me lê ji bo dijberiyê jî çi ji destê wê tê dike. Ya ku di destê wê de maye tenê PKK'ê ye. Dibêje PKK'ê û YPG wek heve. Bi gotina 'PKK'ê Bakur û Rojhilatê Sûriyê dagir kiriye' dixwaze gelên cîhanê manîpule bike. Mixabin kes napirse ka ev dagirkerî çawa çêbuye û kî dîtiye? QSD bi salane DYE û endamên Hêzên Hevpeymanî ên din re bi kar dike. Hemû operasyon bi hev re kirine. QSD'ê û rêvebirên wê her tim bi wan re ne. PKK'ê çawa hat ku Bakur û Rojhilatê Sûriyê dagir kir? Ka rêveberiya vê dagirkeriyê li ku derê ye. Halbikî ew heremên ku hatine rizgarkirin de meclîsên gel hatine avakirin û gel di nava vê pergalê de xwe rêve dibe û ewlekariya xwe pêk tîne. Rêvebiriya Erdogan dibêje bila PKK'ê û YPG'ê tune bibin, dev ji çekan berdin û biçin mala xwe. Qaşo dê hebûna Kurdan li Sûriyê bipejirînin. Wisa tê fêmkirin ku ew qala hebûneke wek Tirkiyê de dikin. Ango rêveberiyeke yekpare û zêde navendî û ew şêwaza rêveberiya ku ew di cîh de dibînin dispêrin Sûriyêyê. Di Tirkiyê de Kurd hene lê ti mafên wan nînin. Li gor makezagona Tirkiyê netew hemû Tirk in. Niha dixwazin heman lîstokê li Sûriyê jî ava bikin. Bila Kurd hebin lê bila nasname û statuya wan tune be. Tirsa 'dibe ku hêzên Rojavayî û hîn beşên Sûriyê di makezagon û zagonan de cîh bidin Kurdan' li wan alandiye. Ji ber wê êrîşên leşkerî zêde kirine. Gohên xwe bangawaziyên cîhanê yên bêdeng kirina çekan re girtine. Komkirina bi hêzên zêdetir ve dixwazin navendên girîng yên wek Kobanê dorpêç û dagir bikin. Erîş û dagirkeriyên li dijî heremên Kurdan rasterast tê wateya paqijiya etnîkî. Ango pêşiya çavên hemû cîhanê eşkere paqijiya etnîkî û sûcên şer dikin. Herî dawî li Til Rifad û Şehbayê jî hat dîtin ku piştê erîşan li wê derê tu Kurd neman.

Erdogan DYA û Hêzên Hevpeymanî bi gotina 'Xeteriya DAIŞ'ê nîne, hûn ji bo alîkariya QSD vê dibêjin' ve gefan li wan duxe. Lê hemû cîhan dibêje DAIŞ ji vê pêvajoyê sûd werdigre, û bi hêz dibe, erîşên xwe zêde dike, metirsî zêde ye. Erdogan tu demê li dijî DAIŞ'ê şer nekir, ji wan re nakokîyê xwe çê nebû. Hemû derd û kulên wî Kurd in. Dibêjin bila di Rojhilata Navîn de Kurd nebin xwediyê tu mafî, bila sitratejiya Tirkiyê ya 'Yek dewlet, Yek millet, Yek ziman' were parastin. Ango guhertina ew hişmendiya xwe ya ji rêzê û ji berkirî nafikirin û vê niha dispêrin Sûriyê jî.

## Berxwedana Kobanê: 2014 – 2024



**Farûk Sakik**

Li Sûrî çi bû? Çi qewimî? Em nizanin. Her tişt bi lez bû. Ji raya giştî re hin tiştên cuda hatin servîskirin û li pişt perdeyan, di salonên lobiyan de hin tiştên cuda hatin plankirin.

Dihat gotin; Îsraîl li Sûrî wê guhertineke mezin çêbike. Wê Sûriyê dabeşke. Kurd jî di vê yekê de wê bibin xwedî statu. Îsraîl wê gav bi gav berê xwe bide Tirkiyê. Ji bo vê yekê Bahçelî xwe avêtibû bextê Kurdan jî.

Sibehekê em şiyar bûn ku bi navê HTŞ'ê tevgerek berê xwe daye Şamê û di roja 13'an de bûye desthilatdarê Sûriyê. Dema ku ew li Şamê bûn. Tirkiyê berê artêş û çeteyên xwe dabû herêmê Kurdan. Herî dawî hatibûn li dora Kobanê mewziyên xwe xûrt kiribûn û dest bi êrişan kiribûn.

Li Kobanê rihê berxwedana sala 2014'an belav bibû. Bi rojane bi hemû teknîka xwe bi hemû çeteyên xwe nikarin Pirek(Qereqozax) 20 metre derbas kin. Darbe dixwin, cesedên xwe li pey xwe dihêlin û bazdidin. Dîsa rewş dişibe sala 2014'an. Hêzên navnetewî bi tenê temaşe dikin, anjî bi tenê daxuyaniyan didin. Senator, fermandarên berê, serok û serokkomar, general, Amerîka, Fransa, Almanya diaxivin ha diaxivin. Behsa îtifaqa xwe ya bi Kurdan re dikin. Li dijî dewleta Tirk a dagirker peyamên pir tund didin. Lê bi tenê daxwiyanî didin.

Di sala 2014'an de dîsa şerê Kobanê heta kêliya dawî temaşe kirin. Dema lehengîya şervanên Kurdan dîtin midaxle kirin.

Bila îro jî wisa li benda fînalê nemînin. Êdî Nazim Daştan û Cîhan Bîlgîn şehîd bûne. Berî şehadeta Nazim û Cîhan, Amerîka û Îsraîla ku Tirkiye di hedefa wan de bû, bêdeng man. Her wek Tirkiye û Îsraîl bi hevre li gor yek planî tevdigerin. Ji aliyek de Îsraîlê berê xwe dayî Sûrî, ji aliyekê jî Tirkiye berê xwe dayê Sûrê. Herdû alî jî ji hev re tiştek nabêjin. Di destpêkê de Îbrahîm Kalin şandin gel Ehmed El Şara û piştî ku ji êrîşên Kobanê encam negirtin Hakan Fîdan şandin Şamê. Herdû kes jî hevalê berê yê HTŞ'ê bûn. Wan ev 12 sal e wan xwedî û perwerde kiribûn. Hevalbendiya wan ya Îdlibê ji xwe tê zanîn. Beşar Esad her tim ji Tirkiyê dixwest ku van hêzên Îdlibê tasviye bike. Lê Tirkiye ew bi israr ji bo vê rojê hiştibûn û parastibûn. Îroj, Tirkiye bedela vê alîkariyê, tunekirina Kurdan jî HTŞ'ê dixwaze.

Hakan Fîdan û Ehmed El Şara dema derketin pêşberî kamereyan, ew pirsgirêkên li Sûriyê ewqas mezin û li benda çareseriyê bûn, dane aliyek, behsa çeka destê Kurdan kirin. Her wek îtiraf bikin, di dest Kurdan de çek hebe êmê nikaribin bi hêsanî bikevin Kobanê.

Kurd jî dibêjin heta dijminatiya Tirkiyê ya li dijî Kurdan hebe wê çek jî di dest me de hebe.

Çeka di dest kurdan de ji yekîtiya Kurdan xurtire. Yekîtiya netewekê di rih de dibe. Yê vî rihî li piya dihêle û diparêze çek e. Di vê serdemê de hin kes ji Ewropa birêketina hatine Kurdistan û behsa yekîtiyê dikin.

Bi derengî ketin. Hûn salek berê li ku derê bûn? Ev rêberiya xweser bi salan e ji bo ev yekîtî pêk were têdikoşin. Li aliyekê jî bersiv didin êrişên dewleta Tirkiyê yê bê sekn û bê navber. Di xutba înê û di nav gel de bi qêrî bibêjî ji PYD'ê hîsab bipirsin, hinek bê wijdaniye.

Di hevîrê ruhê herdû berxwedanên Kobanê de keda PYD'ê heye.